

Welatek Rengîn

Manfred Mai

übersetzt von Mahmut Aydin



Welatê Kokokaka welatekî li pişt çiyayan bû.
Hezar sal bûn pumpu li wir dijiyan.
Her demê li wir pumpuyên mezin û yên piçûk, ên qelew û yên zirav, ên jîr û yên bale hebûn.
Bêguman, her çend ew ji hev cûda bûn jî, tiştekî wan ê hevbeş hebû: kurkê wan ê şîn.

Heta wê roja cara yekem pumpuyek bi rengê sor ji dayik bû.



Dema ku dê û bav ev zarokê xwe yê rengsor dîtin pir tirsiya
Wan pir caran ew şuştin û şuştin, lê dîsa jî rengê wî ma sor.
Dayikê got, "Ez dîsa jî jê hez dikim."
Bav serê xwe hejand û ew pejirand. "Ya girîng ew e ku ew bijûn e, û dê bextewar be jî."
Pumpuyê sor bijûn bû, lê bi rastî ne kêfxweş bû.
Ji ber ku her çi qas dê û bavên wî jê hez dikirin û pumpuyên din jê re baş bûn jî, pumpuyê sor hîs dikir ku ew ji yên din cûda ye. Û carinan ji ber vê yekê xemgîn bû.

	Sibehekê ji dê û bavê xwe re got: "Ez ê biçim û lê bigerim, heta ku ez pumpuyên sor bibînim." Dê û bav dema ev gotin bihîstin, bi qasî cara ewil, a dema ew ji dayik bûbû tirsiyan. Bavê bersiv da, got, "Ne hewce ye ku tu biçî, pumpuyên sor tune ne." "Lê belê, ez jî sor im." "Tu awarte yî." Pumpuyê sor got: "Dibe ku bêtir ên awarte hebin." "Û ez dixwazim wan bibînim." Wî derfet neda ku dê û bavê wî fikrê wî biguherînin û wî li ba xwe bigirin, ew bê pejirandina wan bi rê ket.
	Lê li seranserê welatê Kokokaka qet pumpuyek sor jî tune bû. Bêhêvî û xemgîn cardin rêya malê girt. Dê û bavê wî pir kêfxweş bûn, gava zarokê wan dîsa li ber çavên wan xwuya kir. Û piraniya pumpuyên din jî kêfxweş bûn ku pumpuyê sor dîsa vegeriya malê.
	Pumpuyek qelew got, „Ger ez rastiyê bibêjim, min pumpuyê sor eciband." Hevalê wî yê lewaz jî wiha got, "Ez jî wisa me. Ez difikirim, çêtir e ku ne tenê pumpuyê şîn, di heman demê de yên sor jî hebin." Pumpuyê piçûk çavên xwe girt û zerahiya geş a kulîlkên çûngê yên li kêleka çem fikirî. "Ez jî dixwazim bi rengekî cuda bim." Pumpuyek mezin pejirand: "Ev demeke dirêj e, ez dixwazim ku kurkekî min ê kesk hebe." "Lê min berê qet nediwêrîbû ku ez viya bibêjim."
	Pumpuyê mezin teştek tije av kir, hêşinayiyên cûrbecûr berhev kir û avêt navê. Piştî demekê av kesk bû û pumpuyê mezin ket nav ava di teştê de. Bi baldarî virde û wêde zivirî; carina tilora wî û boçika wî di binê avê de bûn, carna jî serî û xortima wî di nav de bûn. Û hîn pir derbas nebûbû, pumpuyek kesk ji teştê derket. Ji jor heta jêr li xwe nihêrî û ji şabûnê çavên wî birûsîn. Pumpuyek kal ê din di ber xwede got, "Belê, ez nizanim, em pumpu her gav şîn bûn. Û ez dibêjim, divê em wisa jî bimînin." Pumpuyê kesk bersivand, got, "Hûn dikarin şîn bimînin. Lê ez ji pirça xweya şîn pirtir, ji ya kesk hez dikim."

	Yên din jî di nav çend hefteyên pêş de pirça xwe boyax kirin û di demeke nêzîk de êdî pumpuyên bi gelek rengan hebûn. Êdî welatê Kokokakayê ji berê rengîntir bû. Piraniya pumpuyan ev ji şîniya yekrengî pir xweştir dîtin – her wiha hin ji wan ên ku xwestin ku pirça xwe ya şîn biparêzin. Pumpuyê sor di dawiyê de di nav gelek pumpuyên rengîn de xwe rihet hîs kir û êdî ew pir kêfxweş bû.
	Dawî